

Reyîsî jî wek Serkomarên din ên
rejîmê lat û lûtan bi kar tîne

»»» R:7



Hêza şoreşger
divê çawa be

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (408) 22-10-2021 Buha (1000) Tûmen

Zirêbar û gefên li
ser wê golê

»»» R:4

Gefên Tirkîyê û
guhertinên nû


»»» R:8

Li ser lêva kendal

Bernameya pir
niqaş û xerchilg-
irî ya Komara Îslamî
bo çêkirina bombeya
navkî heta ku tê zêdetir
û zêdetir dibe sedemê
jîperawêzkevtina civat-
geha Îranê û eva jî wisa
dike ku cîhan bi lezgîni-
yek zêdetir ve biriyara
yekalîkirî di vê derheqê
de bide; Her çawa wek
gelek ji çavdêr û siyas-
etvanên cîhanî dibêjin
helwêstnegirtinek baş
di niha de dibe sedemê
rêxweşker bo re-
jîma Îranê ku destê wê
bigihe çeka navkî û vê
demê direng e.

Wezîrê Derve yê
Birîtanîyayê “Lîz
Tiras”, roja pêncşemî
rêkevta 29`ê Rezberê
di civînekê digel roj-
nameya “El-şerq El-
weset” de ragihandiye,
bernameya navkiya
rejîmê bi rêjeyek
berçav ve pêşkevtin bi
xwe ve dîtiye û eva jî
wisa kiriye ku keysa
navkiya Tehranê biçe
qonaxek gelek heştîyar
û aloz ku bandora wê
meselê bo zivirîn li ser
maseya civînê diyar e;
Lê digel hemû evane
jî cîhan nikare bînerê
destpêragihîştina
Komara Îslamî bi çeka
navkî be!

Komara Îslamî ji
meha Cozerdanê ve
amade nebûye ku



digel welatên Rojavayî danûstandinê bike û tenê li ser zarê Wezîrê Derve yê
rejîmê cara caran tê gotin: “Tehran piştî gengeşekirinek hewce dê vegere bo
gotûbêjan”. Ev jî di halekê de ye ku aliyên Bercamê û Amerîkayê bi berde-
wamî ragihandine ku dem bo Îranê sînordar û kêmkirî û ger Tehran amade
nebe gotûbêjan berdewam bike, bijardeyên din bo gengeşekirina bernameya
navkiya Îranê, ji wan bijardeya leşkerî ji ber deşt e.

Di vê derheqê de Wezîrê Darayî yê Îsraîlê “Avigdor Lieberman” rêkevta
29`ê Rezberê bi malpera Îsraîlî ya bi navê “Vala News”ê re ragihand: “Ti
pêngavek dîplomatîk nigare pêşiya Komara Îslamî bigire û em jî nikarin
şahidê Koreya Bakurek din bin ku niyaza jinavbirina Îsraîlê heye”.
Ji aliyek din jî rejîm mijûlê nêaramîkirina deverê ye û her di vê derheqê de
Wezîrê Zaniyarî yê Yemenê, “Me`imer Riyanî” di rêze Twitekê de gotiye:
“Amadenebûna Hûsiyan bo hevkarîkirin digel Civatgeha Cîhanê bi biriyara
rastexwe ya Komara Îslamî bûye û ev yeka bo têkdana ewlehî û aştiya de-
verê û cîhaniyê ye”.

Ev yeka Civatgeha Cîhanî zêdetir nigeran kiriye ku Komara Îslamî rê nada
karnas û lêkolerên Ajansa Navnetewî ya Vizeya Navkî serdana binkeyên
navkî yên rejîmê bikin; her di vê derheqê de “Rafaîl Girûsî” Serokê Giştî yê

wê Ajansê ragihandiye
ku divê zilhêz di vê
derheqê de helwêstan
li dijî Komara Îslamî
bigirin û şermezar
bikin; Pêka gotina
“Girûsî” keysa nav-
kiya rejîma Îranê di
qonaxek gelek heştîyar
de ye.

Tevî hebûna wan
givaşan û nigeraniyên
navnetewî, em dibînin
ku Komara Îslamî
biriyara birêvebirina
manhorek leşkerî bo
hêzên hewayî daye
ku “Hemîd Wahidî”
Fermendê Hêzên He-
wayî yê Artêşê dibêje,
tê de mifah ji bom-
bavêj, balafirên şerker,
balafirên bêbalafirvan
û mûşekên zîrek hatiye
wergirtin.

Dîmenên siyasî wiha
nîşan didin ku re-
jîma Îranê dixwaze
bi qewlê Xamineyî
hêzên “çenelêdan”
derfetê bibine serê û
eva jî wisa kiriye ku
ji civînan dûr bikevin
û penahê ber bi hin ji
manhoran ve bibin ku
di rastî de tenê zê-
detir ji caran wan dixe
perawêzê û civatgeha
Îranê ber bi neha-
metiya zêdetir ve dibe
û çî bi neçarî bêne ser
maseya teslîmbûnê û
çî ji egera teslîmbûnê,
rewşê aloztir dike û bi
herdu haletan, ev ber
bi herifînê ve diçe.

Sergotar

Şewazek ji dorandinê

N: Kerîm Perwîzî

Weliyê Feqîh dixwaze Bexda aloz bibe û bi berdewamî guhdarê axûndên Qum û Cemarê be. Di rewşek sar û tejtî ji bêhêvîtiyê de, li 18`ê Rezbera sala 1400an a Rojî, (10`ê Octobera sala 2021)`an hilbijartina pêşweqt a parlemana Îraqê bi rê ve çû. Keşa hilbijartinê lewma sarî û bêhêvîtiyê pêve xuya bû ku piştî çendîn dewre hilbijartin li Îraqê û çend qonaxên cuda ên şerê navxweyî û bûyerên mezin, xelkê bi lidarxistina xwenîşandanan daxwaza guherinkariyan dikirin û ji parleman û hilbijartinê bêhêvî bûn. Bi taybet teva-hiya xelkê çavniheriya vê yekê dikirin ku wê carê ji wekî carên din rejîma Komara Îslamî bi rêya girûp û taqimên nêzî xwe ve bi fêl û deştkarîkirinan encama hilbijartinên parlemana Îraqê bi qazancên xwe biguherin û girûpên girêdayê Spaha Pasdaran û axûndên Qumê deşthilatdarê Bexdayê bin.

Tevî ku gelek ji xelkê Îraqê hilbijartin baykot kiribûn û nêzî ji %60 xelk neçûne ser sindoqên dengdanê, lê bi sedema vê yekê rê ji fêl û deştkariyan hatibû girtibû û çavedêriya navnetewî li ser sindoqan bû û îdareya Bexdayê û bi taybet "El-Kazimî" dixwaştin hilbijartin bibe cihê baweriya xelkê, encama hilbijartinan bû bi derkevtina beşek ji xerîteya rast a hêz bi awayê giştî di Îraqê de, helbet ên ku beşdarê hilbijartinan nebûn bereyek zêdetir bûn.

Bilî hilbijartinên Îsraîlê, eva bêmînaktirîn hilbijartin li Rojhilata Navîn bû ku hilbijartin di asta welatek tejtî alozî wekî welatê Îraqê de bi rê ve here û hilbijartinê bi tevahî azad û herwisa dadperwerane û bê fêl û deştkariyek qedersaz be!

Lewma em dibînin ku Ko

Peyama Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta cejna "Mewlûd"ê



Lêpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê "Mîstefa Hicrî", bi hilkefta jidayîkbûna Pêxemberê Misilmanan, peyamek pîrozbahiyê rû li tev Misilmanên cihanê û nemaze yên Kurdiştanê belav kir.

Peyam wiha ye:

Peyama rêzadar Mîstefa Hicrî, Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta yad û bîra jidayîkbûna Hezretê "Mihemed" (silavê Xwedê li ser be)

Ez bi hilkefta yad û bîra jidayîkbûna Hezretê "Mihemed", Pêxemberê Misilmanan (silavên Xwedê li ser be) pîrozbahiyê li tev Misilmanan û nemaze xelkê Rojhilatê Kurdiştanê dikim.

Ez hêvîxwaz im ku di wê rojê de bawermendên Ola Îslamê û tev Olên din di aşti û birayetiye de bijîn û sepandina çî cure tunûtîjîyeke Olî nemîne.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsiyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

26`ê Rezbera 1400`an a Rojî

18`ê Çirriya Pêşîn a 2021`an

mara Îslamî ya Îranê ji wê hilbijartinê tûre ye û girûpên ser bi wê ji dorandine, çimkî wan derfeta fêlatiyê nebû!

Şikesta Komara Îslamî ya Îranê û aliyên girêdayê wê di hilbijartinan azad û dadperwerane de raştiyeke bingehîn e ku hertim egera qewimîna wê heye, lewma rejîma Îslamî ya Îranê ji sindoqên azad û dadperwerane bêzar e û gelek hez ji sindoqên tejtî fêl û şanokariyan dike.

Girûpên girêdayê rejîmê di wê bûyera dîrokiya Îraqê de sindoqên azad û dadperwerane dorandine û bo guherîna encama hilbijartinê gefa bikaranîna çekan dixwin! Eva dûbare zivirîna bûyer û kiriyaran e bo mala pîlanên Komara Îslamî. Bereyek zêde ji xelkê Îraqê baweriya wan bi hilbijartinan nemabû û ew hilbijartinê dikare baweriyê li cem xelkê diruşt bike, lê Komara Îslamî naxwaze sindoqên dengdanê pîver û pîvane bin!

Komara Îslamî û her bîrkirinek wek wê ku baweriya wan bi azadî û dadperweriyê nîne, sindoqên dengdanê ku yek ji pîverên demokrasiyê ye bikar nayînin, belkî hertim dixwazin rewş aloz û awarte be heta ku bikarin sindoqên dengdana azad a xelkê bêhitbar bikin û gef, girûpên givaş û milîs diyarîkerê encama pîrsgirêkan bin.

Dorandinek dijwar li pêşiya Bexdayê ye, an sindoqên azad û dadperwerane dengê xelkê bike pîver û pîrsgirêkên xelkê bibe nav parlemana nûnerên xelkê û li wir çareser bike, an milîs û givaşên derdor dê serkevtî bin û di wê halê de Bexda dê paşerojeke aloz hebe û di rewşa awarte de be.

Hêza şoreşger divê çawa be?



N: Nûredîn Sofîzade

Di nava hemî netewe û xelkekê de ku dema zilm û zor û qirkirin hebe, dema ku axa neteweyekê hate dagîrkirin, dema ku ji aliyê neteweyekî hakim û baladest ve hemî maf û azadî û kerameta xelk û netewa bin dest hate zevtkirin, bê guman komek ji kesên herî xwedan xîret û xwedî heşt, nikarin bêdeng bin û serî hildidin û li dijî zalim û dagîrkeran disekînin, ew kesane ku bona berevanî ji gel û xelkê xwe serî hildane, li pêxema bideştveanîna maf û azadiya gelê xwe amade ne her nîrxekê didin û canê xwe didanêne ser destê xwe û amade ne li wê rêyê de gorî bikin, ew kesane kesên şoreşgêr in.

Ger komek kesên şoreşvan serî hildan û hemû li pêxema armanckê de rabûne ser xwe, bona bihêzbûna xwe û şoreşa xwe dest didine destê hev û di dor bernamêyê de ku şiroveya armanckê dike, kom dibin û di wê rêyê de xebatê dikin.

Rêkxistin û hizbek dikare wan mirovên şoreşgêr di nava bazinê de kom bike û ew hizb yan rêkxistin bi pêkhatina mirovên xebatkar û şoreşvan ku bo armanckê pîroz serî hildane, dibe hizb yan rêkxistinê şoreşvan û ji ber vê ku armanca xebata wan mirovan di nava wê partiyê de, armanca neteweyekê ye û bona rizgarî û bideştveanîna mafê netewa xwe xebatê dikin, raştevxwe dibe hizbeke şoreşgêr û bingeha wê partiyê nasyonālîzma netewî û xebat di pêxema rizgariyê de ye.

Di nav netewa Kurd de jî bi dirêjîya dirêkê ku Kurdiştan hatiye dagîrkirin û mafê



netewî yê Kurdan hatiye zevtkirin, mirovên şoreşvan ji bo paraştina gelê Kurd li hember zilm, zor, êrîş û siyaseta qirkirina dijminan de serî hildane û şoreş kirine.

Di Nivîya sed sala 20an de bo yekem car li ser bingeha heşt netewî li Rojhilatê Kurdiştanê rêkxistinêk ava bû û li jêr navê Civata Vejdandina Kurd "Komeleyî Jiyaneweyî Kurd" (JK) pêk hat, piştî sala 1945an li ser wê bingehê Partiya Demokrat a Kurdiştanê hate avakirin, yekemîn armanca wê partiyê rizgariya netewî bû.

Li vir û di wê gotarê de armanc nasandin û mehta PDKÎ nîne ku ew 76 sale bê sekînanandin li pêxema armanca netewî de xebatê dike û tenê demekî kurt be jî sitratêjiya xwe ku pê tê pênasêkirin neguheriye.

Belkî armanc ji vê nivîsînê eva ye ku ez dixwazim vê yekê bigehînim ku hekî Part yan rêkxistinêk di destpêkê de li ser armanc û stratêjiya netewî hate avakirin, baş tê fêmkirin ku bikirên wê dirûşmê di nava gelê Kurd de zaf in, tenê bi armanca xweteyarkirinê xelkekî zêde dora xwe kom bike, basê rizgariya Kurd û Kurdiştanê dike.

Partiyek ku bi bawer û îrada netewî hatibe avakirin, bê guman esalet û koka wê di nava gel de tête çandin ku êdî ew ji qalibê partiyekê diçe derve, belkî heya ser digel gelê xwe sadiq û rast e, lewma dibe rênîşander û pêşeng û alahilgirê xebata netewa xwe û ti caran gel wê partiyê yan rêkxistinê ji xwe cuda nizane û xebat û serkevtin û ketina wê ya xwe dizane.

Gelê me bin dest e, axa Kurdiştanê niha jî di bin dagîrkariyê de ye, hemî maf û azadiyekî netewa Kurd niha jî jê hatiye zevtkirin, lewma divê partiyên şoreşvan ên Kurd ku li pêxema rizgariya netewî de xebatê dikin jî digel gelê Kurd sadiq û rastbêj bin.

Ne eva ku her girûpek li pêxema berjewendiya girûpa xwe de, tenê bi dirûşmên netewî bixwaze hêza madî, me'newî û miroviya xwe ji gelê Kurd bistîne, lê bera xebatê bade aliyekê ku zêdetir bi qazancê dijminane.

Partiyek ku li ser bingeha nasyonālîzma netewî û bona bideştveanîna mafê gelê Kurd hatibe avakirin, bê hekî gorî berçavgirtina zirûf û qonaxên xebatê taktîka xwe jî biguhere, bê guman nabe armanc û stratêjiya xwe biguhere.

Hingê gel gelek baş dizane ku ew partiye tenê bo xwe û berjewendiya xwe û hin caran jî bi qazancê dijminan di meydanê de maye, lewma dîr ji vîjdanê ye ku hemî hêza xwe ji gel vergire û wê pitansiyel û hêzê bo armancên gel neyêxîne kar.

Erê gelo tu bêjî Partiyên wisa di nava Kurdan de hebin û gel heya niha nenasîbe?

Zirêbar û gefên li ser wê golê



N: Behzad Qadirî

W: Behzad Simko

Zirêbar goleke sirûştî ya ava şîrîn e ku di 3 kîlometriya rojavayê Merîwanê de ye, çavkaniya ava wê golê kaniyên di bin wê golê de ne û ava ti çemekî bo wê golê naheerîke, herwisa avrêja wê golê çemê Zirêbarê afirandîye ku ji deşta Merîwanê derbas dibe û tevî ava çemê Sîrwanê dibe.

Zirêbar û sirûştta derdora wê ku ji deşt, çiya, dariştan û canjiberên cur bi cur pêk hatiye, yek ji seyrangehên binvaûdeng ên geştiyarî li Rojhilatê Kurdistanê ye. Bilindahiya asta wê golê ji asta avên azad, 1290 metr e û dirêjahiya wê zêdetir ji 8 kîlometran û berpaniya wê nêzî 3 kîlomertan e.

Zorêbar cihê rêjeyeke zêde ji canjiber û balindeyan e û her salê xwanexêtiya balindeyên koçer dike û tim bûye sedema zêdetirbûna biyolojî li deverê.

Mixabin tevî girîngiya gola Zirêbarê bo xwezaya deverê û herwisa amadebûna kesên dilşewit û rêkxirawên medenî, reftara neşiyaw a binav berpîrsên rejîmê digel wê golê, gola Zirêbarê xistiye metirsiyê û niha zêdetir ji her demek li dîroka wê golê, zêdetir rastî metirsiyan hatiye. Rêjeya metirsiyên li ser gola Zirêbar roj bi roj zêdetir dibin û ew wênaya bê mînak ku bo Merîwan û Rojhilatê Kurdistanê bûye nasnameyek, mixabin ber bi jinavçûnê ve diçe.

Yek ji metirsiyên li ser gola Zirêbarê, gellaleyên nezaniştî ne. Di Kurdistanê de bi 100an gellalên nezaniştî tene dîtin ku bi em



bi balkêşandineke hûr ve dibînin ku encamên wan gellalan ti dîtingeh û lêkolîneke zaniştî û jîngehî li ser nehatiye kirin û zêdetir ji her tiştî, xwezaya deverê ber bi krîzê ve dibe. Yek ji wan gellalan avbenda Zirêbar e ku çendîn metirsî bo gola Zirêbarê afirandîne, xisarên wê avbendê ew in:

- 1-Zirêbar ji goleke sirûştî û bervekirî ve bûye goleke pengurî û dayxiştî.
- 2-Çavkaniyên ava gola Zirêbarê bi sedema lehî û heriya cihên werzêriyê xitimîne.
- 3-Qamûşên derdora gola Zirêbarê bi sedema zêdebûna avê zêdetir bûye û bi agirpêberdana bi zanebûn xisareke zêde bi balinde û xwijok û bi giştî bi ekosîstema deverê gihandiye.
- 4-Rêjeyeke zêde ji ava gola Zirêbarê di demsala germayê de dibe bi hilim û bi heder diçe.
- 5-Bi sedema hilma ava gola Zirêbar û avên avbendên Garan, Derbendîxan, Biniyer û Dariyanê, rêjeya befirbarîn kêm bûye û piraniya mencên hewa û baranê dibine bi baraneke bigurr.

Ji aliyekî din ve, piraniya ava averoyên taxên Merîwanê niha jî tevî ava gola Zirêbarê dibin û dibin bi sedema levitîna ava wê golê ku ew jî li ser canjiberên deverê bûye gef.

Herwisa avakirina neyasayî ya bînyan li herêma Zirêbarê, yek din ji metirsiyên li ser gola Zirêbarê ye; Di heyama çend salên derbasbûyî de siyaseta rawestan li hember wê pîrsgirêkê girtine ber xwe, lê mixabin ew pîrsgirêk heta niha jî çareser nebûye û ew jî nîşandeka kêmkarî û xemsariya aliyên pêwendîdar e; Heta Henga Merzî” ya rejîma Îranê bînyek çend qatî li devera Zirêbarê ava kiriye.

Anîna masiyên biyanî û canjiberan û berdana wan li devera Zirêbarê, yek din ji wan pîrsgirêkan e ku li ser ekosîstema Zirêbarê bûye gefeke micid.

Kolana bîrên avê ku bi rêjeyeke zêde li derdora gola Zirêbarê heye yek din ji metirsiyên gelek micid li ser gola Zirêbarê ye ku divê xelk û kesên werzêr û xwediyên baxçeyan agehdar bin. Di vê derheqê de werzêriya demkî ya bi sedema nebûna perwerdeya hewce ne şarezaiya xelkê deverê, mixabin bi xwe

metirsiyeye din diafirîne; her salê bi rêjeyeke zêde kûdên kîmiyayî yên ku bo deşt û zeviya bikar tînin dirijne nav ava gola Zirêbar.

Mijareke din ku ekosîstema Zirêbarê dixe metirsiyê, zêdebûna raw û nêçîrê û dana îzna çekên nêçîrkirinê ye ku mixabin her salê rêjeyeke zêde ji balinde û ajalên wê deverê dibin bi nêçîra nêçîrvanên ku îzna nêçîrvaniyê ji aliyê rejîmê ve bi wan hatiye dan.

Gola Zirêbar niha ji her demekê zêdetir ketiye bin metirsiyê û hewce ye karên micid ên zaniştî bêne kirin; Ava gola Zirêbarê di heyama 5 mehan de bi tenê li “Pakawa Şerwan” bi qasî 40 hiktaran paşve çûye û bi gelemper li derdora Zirêbar, li nav qamûşan, qobî û giyyayê de nêzî 1300 hiktar kêmkirî bûye.

Bi sedema xitimîna çavkaniyên bin avê yên gola Zirêbar û hişkesaliyê, di demsala Bihara îsal de kombûna ava wê golê negihîşte bi 50 milyon metrên 3cî. Kûrahiya wê golê ku panahiya wê 960 hiktar e nêzî 2 metran e; tenê ava berçav ya gola Zibarê eva ye ku li berpaniya wê avê de tê dîtin; Tenê kêmek av gola Zirêbarê li Zirêbara Piçûk a nêzî “Kanîsanana” û “Gomexirt” û golên “Kanî Gewir”ê de maye.

Madeyên hişber, kevirek û du nîşan



N: Serbest Urmiye

Di çend rojên derbasbûyî de û li gor hin zaniyariyên nû ku di para Kurmancî ya malpera "Kurdiştanmedia"yê de wate malpera sereke ya Dezgeha Ragihandina Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê de hatin weşandin, ji bilî haydarkirina gel ji metirsiyên madeyên hişber, hatiye zanîn ku dezgeha serkut û terorê ya rejîma Îranê, wate "Sipaha Pasdaran" bi terzeke din belaya xwe bedraye serê civaka Kurdiştanê. Tê gotin ku di hewla xwe ya nû de "Sipaha Pasdaran" di pareke zêde ji gund û bajarên Kurdiştanê yên ser bi parêzgeha Urmiyê de, deşt avêtiye çandina "Marijuana" curek ji cureyên malvêranker ên madeyên hişber.

"Marijuana" yek ji madeyên hişber e ku li gor zaniyariyên pisporên saxlemiyê pitir ji 400 maddeyên kîmyayî ji xwe digire ku gefeke herî mezin li jiyan û saxlemiya mirov dixwe. Lê ya girîn di vê pirsê de, rola "Sipaha Pasdaran" a rejîma Îranê ye ku di çandîn û weşandina vî giyayî de û curên din yê madeyên hişber di nava xelkê û nemaze nifşa ciwan de.

Raştiya ku çî veşartin jê re nine, eva ye ku di hemû krîzan û bi xasmanî krîzên civakî ku raştî gel di din siya rejîma Îranê de hatine, rola "Sipaha Pasdaran" e. Di vê derheqê de jî yek ji kiriyarên dijî mirov yê hêza rejîmê, belavkirina madeyên hişber di nava civakê de ye. Bi terzekê ku tê gotin bazerganiya madeyên hişber ji bilî alavek xurt ya serkutkirina gel, yê bûye çavkaniyeke bihêz a aborî jî bo rejîmê û navendên wê yê serkut û terorê netenê di Îranê de,



belkî di seranserê cîhanê de.

Madeyên hişber û serkutkirina sipî

Li gor raportên navendên navneteweyî li derheq madeyên hişber di Îranê de, %40 û renga zêdetir jî ji madeyên hiber yê ku derbasî Îranê dibin, di hundirê Îranê de tîr berhevanî. Bi terzekê ku li gor gotina "Eskender Muimênî", binav nûnerê meclîsa rejîma Îranê di sala 2019 a Zayînê de, rojê 2080 kilo ji madeyên hişber di terzên cuda de di hundir Îranê de tîr bikaranîn. Her wiha tê gotin ku berhevanîna madeyên wekî "Şîşe û Kirak" di Îranê de bi awayekî balkeş dimeşe.

Di vê derheqê de hekî ji karnameya karê rejîma Îslamî ya Îranê tê mêzêkirin, îdam weke cezayekî xweser yê rejîmê pitir balkeş e. Di piraniya dosiyayên îdamê de jî ku rejîmê li dijî gel vekirine, sûça wan madeyên hişber e. Wate bi vî awayî rejîm him bi hêceta kirîn û firotinê û him jî bi hêceta bikaranîna madeyên hişber ketiye ser-

kutkirin û kuştina xelkê. Li gor maddeya 8'an a yasaya lihemberderketin li dijî madeyên hişber ya rejîma Îranê, cezayê giran di benda wan kesan de ne ku dosyaya madeyên hişber ji wan re hatiye vekirin. Di vir de cezayê îdamê pitir balkeş e û heya niha pitir jî hatiye dayîn. Ji aliyê din ve jî, ji bo kesên ku madeyên hişber bikar tînin, cecayên weke girtîngeha dûr û dirêj û lêdana qemçûyan di yasa rejîmê de hatiye.

Rejîm û navenda xwe ya terorê, wate "Sipaha Pasdaran" di vê rêyê de ji bilî têkşikandina kesayetiya mirov di civakê de, ji heps û îdamê jî weke alavek din bo kontiroolkirina hêza gel li hember siyasetên gemar ên xwe mifahê werdigire.

Madeyên hişber û aboriya heyama dorpêçê

Dahata ku di rêya bazerganiya madeyên hişber de tê kîskê rejîma Îranê bi qasekê zêde hatiye texmînkirin ku piraniya navendên siyasî, dîplomatîk û leşkerî û serveyî

hemûyan jî "Sipaha pasdaran" û taya wê ya nasikirî bi "Sipaha Quds" tim pêve mijûl in. Bi taybetî piştî sepandina dorpêçên aborî bi sedema siyasetên terorîstî û dijî ewlehiya cîhanî yê rejîmê, "Sipaha pasdaran" pişka herî zêde ji îmkanatên xwe yê siyasî, dîplomatîk û locîstîkî, ji bo bazerganiya madeyên hişber tekûz kiriye. Li gor zaniyariyên navneteweyî, di dema deştîbikarbûna rejîma Îslamî di Îranê de heya niha, qaçax derbaskirin û bazerganiya madeyên hişber ji welatê Efxaniştanê ve bi rêya Îranê û bo welatên din ên seranserê cîhanê ji rêya navendên rejîmê nemaze "Sipaha pasdaran" ve yê bûye hegera vî çendê ku bi miliyonan dolar bi deşt rejîmê bikevin. Ev çend jî yê bûye sedem ku heya qasekê rejîm bikare bandora dorpêçên cîhanî li ser navend û demûdezgehên girêdarê organên xwe sivik bike û deşt rejîmê di siyasetên tevlihevkirina tenahî û ewlehiya herêmî, cîhanî de vekirî bimîne û piştevaniya taqim û girûpên terorîstî ên xwe di deverê de bike.

Komîteya Destûra Bingehîn û nebûna lihevkerinek siyasî û yasayî



N: Şadî Hacî "Yasanas"

Digel destpêkirina civînên gera şeşem ya Komîteya Mini-Deştûrî, li roja duşemê 18'ê Cotmehê li Cenevreyê, tevî vê ku Nûnerê Taybet yê "NY" li Sûriyê "Geir Pedersen" ragihand ku lihevkerinek di navbera wî û serokên herdu şandên opozisyonê û rejîmê de li ser rêbaza karê komîteyê li ser sê stûnên sereke yê derbarê rêzgirtina taybetmendiyên û rêzikên bingehîn yê destûrî û pêşkêşkirina tekstên destûrî yê sereke berî destpêkirina civînan hatiye kirin, lê ez dibînim û wekî xuya ye ku komîte dê di valahiyekî de tev bigire, ji ber nebûna têgihîştin û lihevkerinên siyasî û yasayî yê rasteqîn di navbera hêzên herêmî û navneteweyî de yê kartêker di krîza Sûriyê de, ji ber nebûna îradeyeke cidî ya navdewletî û herêmî ji bo bidestxistina çareseriyê siyasî û çibicîkirina biryara jimare 2254 ya Encûmena Ewlekariyê, ji ber ku ew lihevhatina behsa wê tê kirin, bi tenê bi devkî ye û girêdayî bi ti delîve û destkefteke pratîkî yan jî bi kiryareke siyasî li ser erdê ji aliyê herdu aliyên kirîza Sûriyê (opozîsyon û rejîm) ve nîne, û ji ber vê yekê ji çarçoveya daxuyaniyên dîplomatîk der nakeve, zêdebarê ku komîte li gorî pêkhatiyên gel bi awayekî diruşt û dadmendî li gorî rol û maf û rêjeya her pêkhatiyekî nehatiye damezrandin, bi taybetî pêkhatiya Kurd.

Ji aliyekî din ve, di encama rola Rûsî ya bihêz di Sûriyê de, û rola lawaz ya Ewropî, dudiliya Amerîkî, û nebûna helwestek cidî, wisa dixuye ku rê ber bi rewakirin û nûvejandina rejîmê ve



diçin û pêşî li guhertinên bingehîn di Sûriyê de têne girtin, ji ber vê yekê, dibe ku karê Komîteya Destûra Bingehîn bêhtir bikeve di çarçoveya serrastkirina destûra heyî de, û ne jî dariştina destûrek nû be, lewra ji ber vê yekê xuya dibe ku şanda nûnerên civaka sivil bi awayekî sîstamîk û plankirî tê perawîzkirin û rola wê di Komîteya Destûrî de tê piştguhixistin, heta ku nûnerê NY, Geir Pedersen jî di vê gerê de bi serokên herdu şandên opozisyonê û rejîmê re dicive û daxwaza pêşniyarên wan dike û li gel wan gotûbêjan dike, hevdem ku ti girîngiyekî nade şanda Civaka Sivil ya Komîteya Destûrî.

Derbarê pirsê Kurdî û maf û daxwazên gelê Kurd li Sûriyê, ez bawer dikim ku ew bi rêya nûnerên ENKS'ê yê di Komîteya Destûrê de, çî siyasatmedar bin yan jî çî yasanas bin, nayên bidestxistin, bi rêzgirtina min ji wan re wekî kes û xebatkar, tevî ku ew cihê rêz û hurmeta me ne, lê çiqasî jêhatî bin û şarezaiya wan çiqasî bilind be, wê nikaribin tiştekî bideştbin, heger ne bi rêya lihevkerinek siyasî di navbera aliyên siyasî yê beşdar di komîteya Destûrî de ("Opozîsyon, Rejîm û Civaka Sivil) û lêvegerên wan aliyan yê navçeyî û navdewletî, ku mijara aliyê teknîkî ji bo nivîsandina wan naverokên ku lihevkerin li ser bîne kirin, dê bikeve derveyî bazinê karê Komîteya Destûrî li pişt perdeyan û di bin mase û jorên girtî de bi zimanekî yasayî yê pêwîst ji hêla nûnerên yasanas yê aliyên komîteya destûrî ve.

Li vir divê em vê pirsê girîng ji Encûmena Niştimanî ya Kurd û nûnerên wê yê di Komîteya Destûrê de bikin, nemaze ji siyasatmedarên wê bipirsin: Erê; we wekî van lihevkerinan ji derveyî Komîteya Destûrê bidest xistine?



Nerîna Lîderan



“Rafael Grossi”:

“Êdî Ajans nikare çavdêriyê bi ser navkiya Îranê de bike çimkî Îranê pêşiya dûrbînên me girtiye”.



“Ned Price”:

“Divê danûstandina Viyenê li cihê ku hatibû sekînanandin bê destpêkirin”.



“Marco Rubio”:

“Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hêza Pêşmerge Kurdistanê li şerê dijî terorê de wekî hevpeymanê Amerîkayê bûne û Herêma Kurdistanê cihêk aram e, divê Amerîka piştevanîyê jê bike”.



“Mezlûm Kobanî”:

“Armanca Tirkîyê ji êrişên wê dawiyê handan bo şer e”.

Reyîsî jî wek Serkomarên din ên rejîmê lat û lûtan bi kar tîne



N: Eskender Ceiferî

Îbrahîm Reyîsî Serkomarê nû yê rejîmê di rêbaza çewt a bikaranîna lat û lûtan de berdewam e.

Di van 42 salan de her ji dema propagandeyên hilbijartinan ve heya hatina Serkomarêkî din ê rejîmê, lat û lût, tim ji aliyê rejîmê ve ji bo tepisandina xelkê hatine bikaranîn.

Ji bilî vê, di van 42 salan de tepisandina neteweyên nefars jî her berdewam dike.

Ji sala 1979’an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên Serkomariyê û hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ê gelê xwe.

Di 11 gerran de heft kes weke Serkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sîncor e û nikarin tiştêkê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikin.

Di salên di navbera 1979’an de heya 1981’an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî Serkomar bûn. Lê Serkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981’an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên Serkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed



Xatemî û Mehmûd Ehmêdîniyad her yek du salan Serkomar bûn. Hesen Rûhanî jî piştî wan hat û piştî wî, Îbrahîm Reyîsî hat. Tevî ku Serkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmêdîniyad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwaştin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009’an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezaretên Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmêdîniyad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasîya rejîmê, gelek dangan bi deşt xwe ve bîne. Lê pişt re wezaretên Navxwe ragihand ku navê Ehmêdîniyad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwedîya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarin deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di deştêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekîşîna hin berendam, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartinan herî dawî ya 2017’an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet

ji 6 kesan re hate dayîn. Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarî selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistinêna Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingeîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwedîyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedr jî ku 78 ji sedî dangan bi deşt xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dûrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li piştê Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de piştê Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dûrxistinê wî ji postê Serkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwaşt bibin berendamên Serkomariya Îranê.

Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009’an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarî bi ser Ehmêdîniyad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dangan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Taybetmendiyê hevpar a hemû Serkomarên rejîmê jî ew e ku lat û lûtan ji bo tepeserkirina xelkê bikar tînin.

Gefên Tirkîyê û guhertinên nû



N: Ebdûlazîz Qasim

Li heftiya borî û wekî bersivdanek li ser kuştina du leşkerên hêzên taybet yê Tirkîyê li bakurê Sûriyê, carek din gefên herî tund li ser zarê Serkmarê Tirkîyê “Receb Teyib Erdogan” û Wezîrên Berevanî û Derve yê Tirkîyê li dijî hêzên HSD hatin.

Rûsya ji aliyê xwe ve bi awayekî çavnerêkirî bersiva van gefên Tirkîyê da, bi rêya êrîşeke esmanî ya balafirên Rûsiyayê li ser derdora bajarê Mar’h di bin kontrola Tirkîyê de, ku ev peyameke zelal bû ji aliyê Rûsiya ve, ku Tirkîye li Sûriyê nikare ti operasyoneke leşkerî pêk bîne bêyî rêkevtin bi Rûsiyayê re û herwisa ev yek nîşan dide ku civîna dawî ya serokên Rûsya û Tirkîyê li Soçî di 29 meha borî de serkevtî nebûye.

Ji aliyekî din ve, wekî çavdêrên siyasî dibînin ku îro tîkiliyên Tirkîyê bi Amerîkayê re di astêk herî xirab de ye, nemaze ji hêla tîkiliyên kesane di navber “Joe Biden” û “Erdogan” de, bi awayekî zelal ev yek xuya bû di civînên Civata Giştî ya NY di meha borî de, ku Serok “Joe Biden” red kir ku pêşwaziyê li serokê Tirkîyê “Erdogan” bike, tevî dirêjkirina yasa rewşa awarte ya derbarê Sûriyê û berdehamiya sizayên Amerîkî li ser Tirkîyê ji aliyê Serok “Joe Biden” ve, û tawanbarkirina Tirkîyê bi tîkîbirina hewldanên şerê li dijî DAÎŞê.

Ev herdu helwestên Amerîka û Rûsiya li hember Tirkîyê, herwiha li hember derbaskirina boriya gaz û petrola Misrê ji bo Lubnanê di nav erdê Sûriyê de, hin mijaran zelal

dike, ku tîgîhiştinek hevbeş di navbera herdu welatan de li ser Sûriyê û Îranê û heta li ser zêdegaviyên Tirkîyê jî peyda bûye, û dibe ku gelek mijarên din piştî lidarxistina civîna ewlehî ya soqolî derbarê Sûriya û Îranê di navbera Rûsiya, Îsraîl û Amerîka de zelal bibin, tevî ku biryar e li roja 22ê vê mehê, Serokê Rûsiyayê “Vladimîr Pûtîn” pêşwaziyê Serokwezîrê Îsraîlê “Naftalî Bennet” bike, li gorî daxuyaniya ofîsa “Bennett” dayî ku civîn li ser gazîkirina “Pûtîn” di 22ê Cotmehê de li bajarê Soçî yê Rûsiyayê were lidarxistin.

Tirkîye di salên borî de, bi mifawergirtin ji destêwerdana xwe di krîza Sûriyê û hin krîzên din de, wekî krîza Lîbiya û krîza di navbera Azirbeycan û Erminstanê de, karîbû bibe dewletek mezin û gelek destkevtên mezin yê diplomatîk, siyasî û leşkerî bidest xistin û nemaze di krîza Sûriyê de ku karî bibe hevparê Rûsiya û Amerîka û beşek mezin ji axa Sûriyê dagîr bike, nemaze navçeyên Kurdî, bi “çira kesek” ya Amerîka û Rûsiyayê û herwiha bi mifawergirtin ji nakokiyên di navbera hêzên Kurdî de û bi taybetê ji siyasî û rêveberiya tekalî ya PYD û ji girêdana wê ya li gel PKKê, ku Tirkîyê ev yek wekî hêncet ji bo dagîrkirina Kurdistana Sûriyê û jinavbirina gelê Kurd bikar tîne.

Îro heger Tirkîye ji ber guhertinên nû, herwiha ji ber rewşa xwe ya navxweyî jî nikare gefên xwe di warê pratîkî de bicîh bike, lê hevdem wê bimîne metirsîyeke mezin li dijî maf û hebûna gelê Kurdî, nemaze ku niha parçeyek mezin ji erdnîgariya Kurdistana Sûriyê dagîr dibe. Helbet ku Tirkîye ji biryara xwe ya şer li dijî mafên gelê Kurd venegeriyaye, belkî bi paşxistî ye li hêviya şert û mercên baştir û wê şerê xwe li ser astên din nemaze diplomatîk û siyasî û heta li ser asta komîteya Destûrî jî di bin perdeyan de bi hevahengî bi opozisyonê re û heta hevahengiyê bi rêjîmê re jî wê berdeham bike, û mixabin ku îro tevgera Kurdî ne di asta pêdivî de ye û hêjî mijûl in bi nakokiyên xwe û her roj fatîheyê li ser darbeşa diyaloga Kurdî-Kurdî dixwînin.



Rejîm li parêzgeha Urmîyê madên hişber diçîne

Rejîm bi awayekî bi-zanebûn li deverên parêzgeha Urmîyê ên wekî Urmîye, Şino û Serdeştê de mijûlê çandina “Marîciwana”yê ye û gelek ciwanên wan deverane tûşê wê madeya hişber bûne.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdistanmedia”yê, mohre û kirêgirtiyên rejîma Îranê bi piştevaniya Spaha Pasdaran a terorîst, li deverên Urmîyê yê wekî Mirgewer, Tîrgewer û Somaûbiradûstê, û li deverên Şino û Serdeştê madên hişber ên wekî “Marîciwana”yê diçînin. Ev yeka bûye sedema tûşbûna ciwanên wan deverane bi madên hişber.

Çavkaniyek agehdar daye zanîn: “Kirêgirtiyên ser bi rejîma Îranê li deverên Urmîyê bi hevkarîya hin endamên Spaha Pasdaran li bajarê Şîrazê ku navenda çandin û firotina wê madeya hişber e, wê madeya hişber ber bi wan deveran ve tîne û diçînin.

Tê zanîn ku mohreyên ser bi rejîmê ev yeka li bajaroka Dize û Ziweya Mirgewer û gundên Girdiwan, Jarawa, Gîsiyan, Girik û Rajanê de çandine û ciwanên ku temenê wan di bin 15 saliyê de ye tûşê wê madeya hişber kirine”.

Marîciwana curek ji giyyayê hişber e ku zêdetir ji bo serxweşkirin û ji hişbirin tê



bikaranîn û ev yeka bi derbasbûna dem wisa dike ku mirov bi yekcarî tûşê wê madeyê bike û ji tev civatgehê dûr bixe û dawiyê wekî bengiyekî lê tê.

Piraniya ew kesên ku wê madeya hişber diçînin navê wan li cem malpera “Kurdistanmedia”yê hatiye paraştin, tevî wê ku çendînan caran bi wan re hişdarî hatiye dan lê dev ji wê karê ber nedane, lê ji egera berdeambûn ji wê karê gemar, dê navê tev wan kesên ku wê madeyê diçînin bê belavkirin.

Welatiyek kurd li Bêstûnê bi sedema teqîna mînê birîndar bû

Roja Sêşemî 27`ê Rezberê, welatiyekî kurd yê bi navê “Aram Ehmedî” kurê Walî û xelkê gundê “Zimkan” yê ser bi bajarê Selasa Bawecanî, bi sedema teqîna mînê li bajarê Bîstûnê, pêyê wî birîndar bû.

Ew welatiye piştî wê bûyerê, bo çareserîya pizîşkî bo yek ji nexweşxanên bajarê Kirmanşanê hatiye veguhas-tin.

Di vê derheqê de, roja

Pênşemî 22`ê Rezberê, endameke hêzên leşkerî li deverên sînorî yê bajarê Newsûdê li encama teqîna mînê birîndar bibû û pêyê xwe yê çepê ji deşt dabû.

Bexşdarê bajarê Newsûdê, nasnameya wî leşkeriyê 35 salî, bi navê “Resûl Rehmanî” daye zanîn, ku ew li ser sînorê “Taqedar” ê bajarê Newsûdê bi ser yek ji mînen bicihmayî ên şerê di navbera Îran û Îraqê de çûye û raştî wê bûyerê hatiye.



Bajarê Îlamê meydana “Terebar”ê tinîne

Xelkê bajarê Îlamê û her-wisa werzêran bi sedema nebûna meydana “Terebar”ê çendînan pirsgirêk hene û piştî çendînan salan lipeyketina wan bona avakirina meydana “Terebar”ê, hêj daxwaza wan ji aliyê berpîrsên rejîma Îranê ve nahatiye cibicîkirin.

Wertzêran heta niha çendînan caran daxwaz ji berpîrsên pêwendîdar ên rejîmê kirine ku meydana Terebar ava bikin û piştî çendînan salan hêj wan berpîrsên rejîmê ti pêngaveke serast bo avakirina wê

meydanê hilnegirtine.

Wertzêran gotine, ku ger meydana Terebar bê avakirin, ew dikarin îmiş, pincar û berhemên din ên xwe bi nirxek baş û bi awayî raasterast bifiroşine xelkê, lê bi sedema avanebûna wê meydana ew neçar in bi nirxek kêmtir bi delalên bazarê bifiroşin.

Bi sedema nebûna meydana Terebarê taybet bo firotina “Terebar” li bajarê Îlamê, beşa navendî ya wî bajarî wekî bazara firotina “Ter-



ebar” tê bikaranîn ku bûye sedema trafîkek zêde li navenda bajar.

Festîvala Wêjeyî ya Mem û Zîn romannivîs Jan Doşt xelata kir

Li bajarê Hewlêrê Duyemîn Festîvala Wêjeyî ya Mem û Zîn birêve çû û tê de nivîskar û romannivîsê Kurd yê ji bajarê Kobanî yê Rojavayê Kurdistanê Jan Doşt hate xelatkirin.

Bi serperiştiya Wezareta Rewşenbîrî û Ciwanan a Herêma Kurdistanê, li Hewlêrê Duyemîn Festîvala Wêjeyî ya Mem û Zîn birêve çû. Di festîvalê de panelek ji bo giringiya wêje û zimanê Kurdî di navbera nivîskarên her çar parçeyên Kurdistanê de hate lidarxistin.

Di vê derbarê de Rêveberê Navenda Mem û Zîn Yaran Hîwa ji K24ê re got: “Duyemîn festîvala me, bi hevahengiya Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Hewlêrê li dar ket. Di fîstivalê de, em nivîskarên her çar parçeyên Kurdistanê kom dikin, ji bo wê peyamê bidin ku em yekdem in û yek xak

û yek zimanê me heye.”

Duyemîn Festîvala Wêjeyî ya Mem û Zîn xelata xwe ya îsal pêşkêşî nivîskar û romannivîs Jan Doşt kir.

Romannivîs Jan Doşt di derbarê vê xelatkirinê de ji K24ê re got: “Ez bi vê xelatkirinê kêfxweş im. Ez pê dihesim ku xwedîlêderketina li wêjeyê di nav Kurdan de heye. Kesekî ked û xebata wî hebe, wî xelat dikin û qedrê wî dizanin. Ev jî yek ji xwaştên seydayê mezin Ehmêdê Xanî bû ku millet nivîskarên xwe nas bikin û guhdariya bîr û baweriyên wan bikin û her çendî rexneyên tûj jî bikin, dijmatiya wan nekin. Ez spasiya Dezgeha Rewşenbîrî a Mem û Zînê û Wezareta Rewşenbîriyê dikim ku ez vexwandim û xelat kirim.”

Beşdarên vê festîvalê ji her çar parçeyên Kurdistanê bûn



û ji derveyî welat jî hatibûn vexwendin.

Di festîvalê de gotara Birîkarê Wezareta Rewşenbîrî û Ciwanan a Herêma Kurdistanê hebû û Parêzgarê Hewlêrê jî beşdarî festîvalê bû, herwiha ev festîval bi hevahengiya Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Hewlêrê li hola rewşenbîrî hate lidarxistin. Ç: KURDISTAN 24

Hozan Canê bi girtîgehê hate cezadan

Hunermanda Kurd “Hozan Canê”, bi hinceta “propagandaya rêxistinê” bi 3 sal û mehek û 15 rojan hate cezadan.

Sêyemîn Dadgeha Giran a Edîrneyê, Hozan Canê bi hinceta propagandaya rêxistinê bi 3 sal û mehek û 15 rojan ceza da.

Hunermanda Kurd “Hozan Canê” ku di çarçova xebatên hilbjartinê yên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) de li Edîrneyê bû, roja 24ê Hezîrana 2018an hatibû binçavkirin, Mijdara 2018an jî, ji aliyê Dadgehê ve bi tohmata “endama yek ji partiyên opozisyon ên dijberê Tirkiyê” bi 6 sal û 3 meh girtîgehê hatibû cezadan. Hozan Canê piştî derbaskirina 2 salan girtîgehê, di Cotmeha 2020ê de bi mercê qedexeya derve serbest hatibû berdan. Hozan Canê piştî rakirina qedexeya derketina wê ya derve, di 15ê Tîmehê de çûbû Almaniyayê.



Doza Hozan Canê li rêkevta 18-10-2021`an di siyemîn Dadgeha Giran a Edîrneyê de, bi rê ve çû. Hozan Canê beşdarî dadgehê nebû û parêzerên wê paraştina wê kirin.

Parêzerên Hozan Canê Nevroz Akalan û Mustafa Pekoz, bêtawaniya muwekîlê xwe anîn ziman û ji dadgehê daxwaza hilweşandina dozê kirin.

Dadgehê, Hozan Canê ji endamtiya rêxistinê bêtawan da zanîn, lê bi hinceta “bi zanebûn alîkariya rêxistinê” 5 sal ceza da. Dadgehê, ji ber Hozan Canê pêştir ti tawanek nekiribû û helwesta wê ya di dema darizandinê de li ber çav girt û ceza bo 3 sal û mehek û 15 rojan kêmkir.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Mihemedtahîr Husênûr 15 meh girtîgeh bi ser de hate sepandin

Welatîyekî kurd ê bi navê “Mihemedtahîr Husênûr”, temen 26 sal û kurê Riza û xelkê bajarê Nexedeyê, ji aliyê dadgeha wî bajarî ve bi 15 meh girtîgehê hate cezakirin.

Ew welatî ji aliyê dadgehê ve bi “herifandina milkên giştî” û “beşdarîkirin di xwepêşandanên meha Gelawêja îsra li Nexed”ê hatiye tometbarkirin.

Cezayê wî li heyama rojên derbazbûyî de bi fermî bi navbirî re hatiye ragihandin.

“Mihemedtahîr Husênûr”, 25`ê Gelawêja Îsa, bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkiribûn û piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê, bo girtîgeha bajarê Nexedeyê hate veguhaştin.

Welatîyekî xelkê bajarê Baneyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Sêşemî 20`ê Rezberê, welatîyekî Kurd ê bi navê, “Şerîf Emînî”, temen 37 salî, kurê Ehmed û xelkê gundê “Şuwê” ê ser bi bajarê Baneyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihek nexuya hate veguhaştin.

Ew welatiye bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin û heta niha lipeykevtina malbata wî welatîyê bo agehdarbûn ji qedera navbirî bê encam maye.

Heta niha ji sedem binçavkirin û tohmata ku bi ser “Şerîf Emînî” de hatiye sepandin, ti zaniyariyek ji ber dest de nîne.

Roja Yekşemî 2`ê Xermanana sala 1399`an, ew welatîyê Kurd bi bê ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û roja Yekşemî 23`ê Xermanana heman salê, bi danîna barimteya 100 milyon Tumenî, bi awayekî demkî ji girtîgehê hatibû azadkirin.

“Şerîf Emînî”, piştî binçavkirinê li meha Xermanana sala 1399`an, bo lêpîrsînê bo girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê hatibû veguhaştin û piştî ji aliyê taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê Seqizê ve, bi tohmata “endambûn digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê”, bi 8 meh girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Elî Zulfî bo cîbicîkirina cezayê xwe bo girtîgehê hate veguhaştin

Îro Yekşemî 25`ê Rezberê, welatîyekî Kurd ê bi navê “Elî Zulfî” kurê Hemze û xelkê bajarê Bokanê, bo cîbicîkirina cezayê xwe, bo girtîgeha wî bajarî hate veguhaştin.

Ew welatiye, ji aliyê taya 101 a dadgeha keyferî ya bajarê Bokanê ve, bi serokayetiya dadwer “Peyman Roştêmî”, bi 4 meh û 10 roj girtîgeh hatiye cezadan.

Dadgehê ew welatîyê Kurd bi tohmata, “propagende li dijî nizamê” ceza dabû û ew cezaye jî di heyama çend rojên derbasbûyî de, bi wî welatîyê re hatiye ragihandin.

Kombûna dadgehîkirina navbirî, meha Pûşpera îsal li taya 101 a dadgeha keyferî ya bajarê Bokanê bi rê ve çûbû.

Roja Yekşemî 3`ê Reşemeya sala 1399`an a Rojî, “Elî Zulfî” bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî ji girtîgeha wî bajarî hatibû azadkirin.

Ew welatîyê Kurd, piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê li yek ji girtîgehên ewlehî li bajarê Urmiyê, bo girtîgeha bajarê Bokanê hatibû veguhaştin.

Elî Zulfî, piştî binçavkirinê ji peywendiya telefonî, çavpêkevtin digel malbata xwe û herwisa destpêregihîştin bi parêzer hatibû bêparkirin.

Şeva Sêşemî, 30`ê Befranbara sala 1399`an, li berdewamiya binçavkirina welatîyên Kurd li bajarê Bokanê, ew welatiye ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî, êrîş kirine ser mala wî welatîyê û navbirî binçav kiribûn.

Herwisa hêzên ewlehî li dema binçavkirina “Elî Zulfî”, şûşeya der û pencerên mala wî şikandin.

Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiستانmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (408)

Wêne: Xwenîşandana endam û alîgirên PDKÎ li derveyê welat li dijî rejîma Îranê

